



## MAFÊN MIROV ÊN BINGEHÎN BO ZÎNDANIYÊN welatîyên BIYANÎ YÊN (FNPS)

### Agahî

1. Di dema hatin girtinê û gava destpêbûna binçavbûn yan zîndanîbûnê yan jî demildest piştî wê da, mafê wergirtina agahiyên li bara mafên xwe bi zimanê ku ew fêhm dike û çawan bidestana wan mafan bo xwe. (UN Principles 13-14, CoE Police 55)
2. Mafê wî heye hokar û sebeba hatin girtinê û sûcên xwe bi zimanekî ku zîndanî fêhm dike, bizanibe. (ICCPR 14.3, UN Principles 10, EU2012 6)
3. Mafê wî heye kesekî bi dilê xwe ji binçavbûna xwe aghadar bike. (UN Principle 16.1, CoE FNP 15.2, CoE Police 57, EU2012 4.2 c)
4. Mafê wî heye li bara qanûnên zîndanê û maf û erk û wezîfeyên zîndanîyan bi zimanê ku fêhm dike agahiyan wergire. (UN Rec 4, SMR 54-55, EPR 30.1, CoE FNP 15.1)
5. Mafê wî heye ji heqên konsulî agahdar be, bi rayedarên konsulî ra pêwendiyê çêbike û jê ra serdan û arîkariya konsulî hebe. (VCCR 36.1 b-c UN Principles 16.2, UN Res (e), UN Rec 4, SMR 62, CAT 6.3, EU Charter 46, EPR 37.1, CoE FNP 24)
6. Mafê wî heye ji imkana veguhestina bo welatê xwe aghadar be. (EPR 37.5, CoE FNP 15.3, CoE Transfer 4.1, EU909JHA 6.4)

### Dadgeha dadwerane

7. Mafê wî heye rêkareke bi bandor û dadgeheke wî ya dadwerane hebe. Her kesê ku sûcdar bûye, heya ku li gorî qanûnê gunehkar nebûye, dê wekî bêguneh were dîtin. (ICCPR 14, UDHR10-11.1, ECHR 6, EU Charter 46-47)
8. Li rêbazên cezayî da, mafê wî heye arîkariya hiqûqî wergire. (ICCPR 14.3 d, SMR 61, UN Principles 17-18, EPR 23, CoE FNP 21)
9. Dema ku zîndanî zimanê dadgehê nizane û yan fêhm nake, mafê wî heye wergêrê devkî yê belaş jê ra hebe. (ICCPR 14.3 f, UN Principles 14, UN Res (c))
10. Mafê wî heye li dadgehê bi wekhevî dadgehî bibe û derengmayîneke nelirê jê ra tunebe. (ICCPR 14.1, 14.3 c)
11. Mafê wî heye bo dadgeha nediyar were azadkirin, meger ku dadgeh yan rayedarên din li gorî berjewendiyên dadweriyê biryareke din bidin. (UN Principle 39, CoE FNP 5)
12. Mafê wî heye bo boykot û kiryarên ne-binçavbûnê wekî gumanbarên din be. (UN Rec 2, UN Res (d), CoE FNP 4, 14.1)
13. Mafê wî heye ji ber ku biyanî ye nekeve ber cezayên zêdetir ên binçavbûnê yan şert û mercên xerabtir ên zîndanê. (UN Res (b))
14. Mafê wî heye heqê tam ê azadbûna zû bo wî jî hebe. (CoE FNP 6)

### Reftar

15. Mafê wî heye bi awayekî mirovane û bi rêz bo hêjatiya mirov pê ra reftar bikin. (ICCPR 10.1, UDHR 5, SMR 1, CAT 1-2, UN Basic Principles 1, ECHR 3, EU Charter 4, EPR 1)
16. Mafê wî heye hemberî şikence yan reftara nemirovane yan biçûkkirinê yan cezakinê were parastin. (ICCPR 7, UDHR 5, CAT 7, ECHR 3, EU Charter 4)
17. Mafê wî heye bi awayekî pê ra reftar bikin ku rewşa taybet û pêdiviyên ferdî yê zîndanîyên welatîyên biyanî werin berçavgirtin. (CoE FNP 3)
18. Mafê wî heye hemberî wî ti cudahî pêk neyê (di warên wekî welatê jê tê û zimanê wî) û hemberî cudahiye parastina kêrhatî wergire. (ICCPR 26, UDHR 7, SMR 2, UN Principles 5, UN Basic Principle 2, EU Charter 21-22, EPR 13, CoE FNP 7)
19. Mafê wî heye wekî zîndanîyên din muqatebûna tenduristiyê û bernamêyên dermanî yê heyî wergire. (EU Charter 35, CoE FNP 31)
20. Mafê wî yê azadiya fikir, zanebûn û dîn û azadiya pêkanîna dua û rê û resmên dînî heye. (ICCPR 18.1, UDHR 18, SMR 65-66, UN Basic Principles 3, UN Rec 3, EU Charter 10.1, EPR 29, CoE FNP 30)

21. Mafê wî heye cil û kincan li xwe bike û paqijiya ferdî bi awayekî biparêze ku dijî hesasiyetên çandî yan dînî yê zîndanî nebe û xwarineke bidin wî ku pêdiviyên çandî û dînî yê zîndanî tê da were raçavkirin. (UN Rec 4, CoE FNP 18,19)
22. Mafê wî heye ti destwerdan û mudaxileya neqanûnî li nihênî, jiyana malbatî û nivîsên wî da tunebin û bikaribe (bi rêya serdanan jî) bi malbat û hevalên xwe ra li demên rêkûpêk hevdiştinan bike. (ICCPR 17, UDHR 12, SMR 58, UN Rec 5, EU Charter 7, EPR 24, CoE FNP 22)
23. Mafê wî heye li zîndanê imkana wergera devkî û nivîskî jê ra hebe û imkana hînbûna zimaneke jî hebe ku pêwendiyên wî hêsan bike. (SMR 61.2, EPR 38.3, CoE FNP 8, 29.1)
24. Mafê wî heye wekî zîndaniyên welatî jê ra perwerde, kar û hînkariyên sergermiyê hebin. (UN Rec 1, SMR 4.2, 71, EPR 26, 28, CoE FNP 27.1, 29)
25. Mafê wî heye bêyî ti sansor li daîreya zîndana navendî yan rayedarên dadê bi rêya kanalên diyarbûyî daxwaz yan gazindeyan bike. (SMR 56, UN Rec 4, EPR 70)

### **Cîwarbûn**

26. Mafê wî heye bi armanca dîsan çêbûn û arîkarî û şiyana civakî yarmetiyê wergire ku amade bibe bikeve nava civakê. (ICCPR 10.3, SMR 4, EPR 6, 107, CoE FNP 9, 29.2, 35)
27. Mafê wî heye li bara rewşa xwe ya hiqûqî û rewşa piştî azadbûnê zûtirkê agahdar be. (CoE FNP 35.2 a)
28. Mafê wî heye hemberî derkirin, veqerandin yan zivirandina bo welatê jê ra xetera cidî ya cezayê mirinê, şikencê yan reftarên din ên nemirovane û biçûkkirinê yan ceza hene, were parastin. (UDHR 14, CAT 3, EU Charter 19.2)
29. Mafê wî heye li bara biryara veguhestina zîndanî bo welatekî din rezamendî û amadehiya civakî hebe. (UN Transfer 1, CoE Transfer 4, CoE FNP 10)
30. Mafê wî heye bi dezgehên derve ra pêwendiyê çêbike bo ku piştî azadbûnê bikaribe bo cîwarbûnê arîkarî û piştevanîyê wergire. (SMR 107-108, 81, EPR 107, CoE FNP 37, CoE Probation 64)

### **Neteweyên Yekbûyî (NY)**

- Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirov (UDHR)
- Peymangeha Navneteweyî li bara Mafên Sîvîl û Siyasî (ICCPR)
- Konvansiyona NY dijî Şikenceyê (CAT)
- Qanûna Standarda Herî Kêm bo Reftara digel Zîndaniyan (Qanûna SMR Mandela)
- Konvansiyona Viyênayê li bara Têkiliyên Konsulî (VCCR)
- Lihevkirina Mînak li bara Veguhestina Zîndaniyên Biyanî (Veguestina NY)
- Rêbazên Bingehîn ên NY bo Reftara digel Zîndaniyan (Rêbazên Bingehîn ên NY)
- Koma NY ya Rêbazan bo parastina Hemû Kesên bin Her Cûre Binçavkirin yan Zîndanîbûnê da (Rêbazên NY)
- Tewsiyeyên li bara Reftara digel Zîndaniyên Biyanî (UN Rec)
- Biryarnameya NY ya 1998/22 Rewşa welatîyên biyanî li dadgehên cezayî (UN Res)

### **Konseya Ewrûpayê**

- Peymangeha Ewrûpî ya Mafên Mirov (ECHR)
- Qanûnên Zîndanên Ewrûpî (EPR)
- Tewsiyeya (2012)12 li bara zîndaniyên biyanî (CoE FNP)
- Konvansiyona li bara Veguhestina Kesên Mehkûm (CoE Veguestin)
- Tewsiyeya CM/Rec(2010)1 Qanûna Azadiya bi Merc (CoE Azadiya bi merc)
- Tewsiyeya Rec(2001)10 ya Qanûna Ewrûpî ya Exlaqê Polîs (Siyaseta CoE)

### **Yekîtiya Ewrûpayê (YE)**

- Menşûra Mafên Bingehîn ên Yekîtiya Ewrûpayê (Menşûra YE)
- Biryara Çarçoveya Konseyê 2008/909/JHA (EU909JHA)
- Rêzika 2010/64 li bara mafê wergera devkî û nivîskî li dadgehên cezayî da (EU2010)
- Rêzika 2012/13 li bara mafên bo agahiyên li dadgehên cezayî (EU2012)